

Dispute & Breakdownên Sponsorgeriyê

Dispute ên Sponsorgeriyê çi ne?

Dibe ku lihevnekirin û şaşjêvînkirin bi awakî xwezayî di navbera sponsorger û nûhatiyên di nava pêvajoya sponsorgeriyê derkeve holê. Ev **dispute** ên sponsorgeriyê cuda duda tèn, hema ji şertûnercên sponsorgeriyê bigire ta bi rayûboçûnên cuda li ser mijarên cûrbicûr. Xweşbextane, nankokiyên sponsorgeriyê hertim nagihin wê encamê ku sponsorgerî **breakdown**.

Dibe ku **breakdown**ên sponsorgeriyê bèn çareserkirin an jî rewşa wan çêtir bibe dema mirov li dû van têbîniyên li xwarê bidin derbarê çawa xwe bidin alî ji **dispute**, **breakdown**, û **default**an. Ew di dokumenta han de di rûpela 4an de ne. Dezgeha Koçrevî, Penaber û Hemwelatîbûnê ya Kanadayê, ango Immigration, Refugees and Citizenship Canada (**IRCC**) dibe ku di **dispute**ên sponsorgeriyê de alî bike bi riya ofîsên **IRCC** yê yên herêmî, ew jî berpîrs in li ser çareserkirina kêşeyên piştî gihêştinê. Ofîsa **IRCC** ya herêmî dê destê xwe di **dispute**êke sponsorgeriyê de werde dema:

- Aliyekê an jî herdu aliyên **dispute**ê daxwaza desttêwerdana **IRCC** yê xwastibin; an jî
- Tu çareseriyek ji nav aliyan derneket ku rewş çareser bike; an jî
- Nûhatiyek xwe gihandibe ajanseke xizmetguzariyên civakî di nava maweya sponsorgeriyê de, û ajans jî xwe gihandibe **IRCC** yê daku derbarê dozê bipirse.

Breakdownên sponsorgeriyê çi ne?

Breakdownna sponsorgeriyê ew daxuyandineke fermî ku “têkçûneke neçakbar” ji bo bi rêkûpêkkirina sponsorgeriyê qewimiye di navbera sponsorgeran û ew kesên nûhatî yên ku ew wan sponsor dikirin. Di rewşên **breakdown**ên sponsorgeriyê de, **IRCC** dê **Declaration of Sponsorship Breakdown** derxîne, tê de peyvlîxwegirtina (teehude) sponsorgeriyê betal dike.

Defaultên sponsorgeriyê çi ne?

Defaultteke sponsorgeyiyê dê were ragihandin hegerhat dîtin ku grûpa sponsorgeriyê berpîrs e li ser **breakdown**ê û hewl nedabûne ku nakokî an jî wan kêşeyên ku rewş gihandibûn **breakdown**ê çareser bikira. **Default**ta sponsorgeriyê dest nîşanî dike ku îxlaleke di erkên grûpên sponsorgeriyê yên li gorî grêbestê de çê bûye an jî ku ew nejkariyên bi awakî serkeftî erkên xwe yên diravî û nediravî bi cih banyana ewên têkildarî **undertakinga** (ji **IMM 5373**) û/an jî **Sponsorship Agreement**.

Çima **Breakdown**ên Sponsorgeriyê diqewimin?

Gelek sedem hene dibe ku bihêlin ku sponsorgerî **breakdown** dibe, ji nav de:

- **Dispute** ek nayê çareserkerin hebe, weke dijberiyek şexsî, hêviyên ne realîstîk, an jî levnekirina li ser asteya piştgirya ku dê bê dayîn bo kesê/a nûhatî.
- Şertûmercên sponsorgeriyê nayên bicihanîn ji ber guherîna rewşa şexsî ya kesê/a nûhatî. Hin nimûne li ser vê:
 - Veqetîn an jî hevberdan;
 - Koçreviya diduyan, ango bi gotineke din, nûhatî biryar dabe ku here herêmeke din, û yê/ya sponsorger nikare an jî dê berdewam neke li piştgirya xwe ji bo kesê/a nûhatî di wê komelgeha nû de.
 - Sponsorger berpisyariya xwe bi cih naynin sebaret bi dabînkirina piştgirya diravî û/an jî ya niştecihbûnê.
 - Kesê/a nûhatî biryar dide ku xwe li alîkariya civakî bigire di nava maweya sponseriyê ya yeksalî de û haya kesê sponserger jê neke.

Divê çi bê kirin heger **dispute ek an jî **breakdown** ekê ya sponsorgeriyê hebe?**

Heger **dispute** eke di nava aliyan de nehat çareserkerin, û wa xuya bû ku sponsergerî dê ji kar bikeve, divê an sponserger an jî kesê/a nûhatî têkilî deyne bi **IRCC** re, bi riya:

- eposteke bişîne ser PSR-PPPR@cic.gc.ca daku têkilî deyne bi ofisa **IRCC** yê yê têkildar; an jî
- Telefonî Call Centera **IRCC** bike li ser jimara: 1-888-242-2100.

1. Hema ku ofisa **IRCC** yê ya herêmî derbarê **dispute** ê hat agahdarkirin, ew ê têkilî deynin ligel grûpa sponsorgeriyê û malbata nûhatî. **IRCC** dê binirxîne ka rewş çiqasî cidî ye û biryar bide heger hewce heye ku xwe têxin meselê.

2. Heger tevlibûna **IRCC** yê pêwîst bû, karmendek fermî ji **IRCC** dê hewl bide ku alî herdu aliyan bike daku **dispute** ê çareser bikin.

3. Karmendek fermî yê/a **IRCC** yê dê weke “navbeynkar” bixebite. Heger tu çareserî nehat dîtin, dê **IRCC** biryara dawî sebaret bi gavê li dûyê bide.

4. Heger di nava qonaxa navbeynkariyê de (ya ku dibe ku bi heftiyên dirêjî bide), pêdiviyên lezgîn ên niştecihbûnê û piştgirya diravî pêwîst bûn, dibe ku **IRCC** kesên nûhatî bişîne desthilatên xêrxwaziyê yê herêmî (ji bo wan kesên sponsorkirî ji aliya **Groups of Five** an jî **Community Sponsors**) an jî wan bişîne bo Resettlement Assistance Program (**RAP**) ango Bernameya Alîkariyê bo Veniştecihbûnê ji bo piştgirya dahata diravî (ji bo wan sponsorkirî bi riya **Sponsorship Agreement Holder**).

5. Heger **breakdown** ek hat ragihandin, **IRCC** dê tesbît bike ka kîjan alî berpirs e. Dibe ku berpirsariya **breakdown** a sponsorgeriyê têkeve stûya sponsorgeran, kesên nûhatî, **IRCC** yê, an jî ne yek ji van aliyan. Heger hat dîtin ku grûpa sponsorgeriyê berpirsyar e, **IRCC** dê biryar bide heger ew grûp sponsorgerî **default** kiriye. Di vê biryardanê de dê bê vekolan heger sponsergeran hewl dabûbin ku rewş çareser bikin.

Divê grûpên sponsorgeriyê bi berdewamî bi erka xwe ya berpirsariyên sponsorgeriyê rabin di nava dema naokiyê de.

Heger **Constituent Group (CG)** an jî **Sponsorship Agreement Holder (SAH)** beşdar bûn, êdî gelek girîng e ku haya **SAH**ê ji **dispute**ê bê kirin daku ew bikarin hewl bidin ku mesele ji hundir ve çareser bikin, ji ber ku ji xwe ew berpirsyar in li ser sponsorgeriyê ne. Di hin haletan de dibe ku **SAH** berpirsariya sponsorgeriyê radestî **CG**eyek din bike, an jî berpirsariyê ser xwe bi xwe bigire. Dibe ku **SAH**a han ji **SAH**eke din bixwaze ku bi erka sponsorgeriyê rabe heta dawiya dema sponsorgeriyê.

Heger **breakdown**eke hat ragihandin, dibe ku sponsorger û bi alîkariya ofîsa **IRCC**yê ya herêmî hewl bidin sponsorgerêk din peyda bikin ku şûnê bigire ji bo kesên nûhatî. Heger grûpeke nû ya sponsorgeriyê nehat peyda kirin:

- Nûhatiyên ji aliya **SAH**ê tî sponsorgerin (an jî **CG** an jî bi sponsorgeriyeke hevpar a **SAH**ê) dibe ku bê şandin bo **RAP**ê ji bo piştigirya dahata diravî hetanî ku an jî ew bikarbin piştigirya xwe bi xwe bikin an jî şertûmercên sponsorgeriyê bi dawî bikin.
- Nûhatiyên ji aliya **Group of Five**êkê an jî **Community Sponsor** tî sponsorgerin dibe ku **Declaration of Sponsorship Breakdown** bo wan bê dayîn û ew bo destihatên parêzgehê yê alîkariya civakî bî şandin.

Encamên **breakdownên sponsorgeriyê li ser kesên nûhatî çi ne?**

Heger **IRCC** wa dît ku kesên sponsorgerî sedema **breakdown**ê bû, dibe ku kesê/a nûhatî alîkarîyên bêtir ji grûpên sponsorgeriyê li Kanadayê û ji **IRCC**yê wernegire.

Encamên **breakdownên sponsorgeriyê li ser sponsorgeran çi ne?**

Heger grûpa sponsorgeriyê ne berpirsyar bû ji ber **breakdown**ê, **Declaration of Sponsorship Breakdown** dê weke “daxuyaniya bê paşguhavêtinê” a **breakdown**ê destnîşan bike. Û hîngê tu encam li ser grûpa sponsorgeriyê çê nabin.

Grûpa sponsorgeriyê dê neyên ragihandin weke berpirsyar li ser **breakdown**ê heger hat dît ku ew:

- Ew berdewan kir li ser dana erkên xwe yê sponsorgeriyê;
- Rewşên ne pêşbînbar bandor li ser qudreta grûpa sponsorgeriyê kir û nema ew dikare bi erkên xwe bi temamî rabe û grûpeke din hat dît daku bi wan bi awakî birêkûpêk rabe, an jî grûpa sponsorger bi awakî berpirsyar lebitî daku sponsorgerêk nû peyda bike;
- Erkên sponsorgeriyê bi temamî nehatin bicihkirin ji ber sedemên durrî kontrola sponsorgeran (bo nimûne, kesê/a nûhatî xwe bi xwe ji komelgeha pêşîn ya veniştcehbûnê bar dîke, û ne ji ber tu nakokî) û kedên hêja ji aliya grûpa sponsorgeriyê hatin danîn bo peyda kirina sponsorgerêk nû.

Defaulta Sponsorgeiyê dê were ragihandin heger hat dîtin ku grûpa sponsorgeriyê berpirsyar e li ser **breakdown, û ku dilê wan naxwze kêşeyê çareser bikin.**

Dibe ku di nav encamên **default**ta sponsorgeriyê de ev xal hebin:

- Dibe ku destûr neyê dayîn bo grûpa sponsorgeriyê ku tu sponsorgeriyêke bêhir bixwaze hetanî ku **default** were çareser kirin.
- Kesên SAH ango xwedî hevpeymanana sponsorgeriyê, dibe ku hevpeymanana wan were rawestandî an jî betalkirin.
- **IRCC** dibe ku bigihe wê encamê ku grûpa sponsorgeriyê nikare bi erka xwe rabe sebare bi haletên ku hîn li derveyî welêt in û amojgariya xwe bike ku erêkirina li ser dozên grûpên yê li ber dest bê kişandin. Dibe ku **IRCC** çavdêriya xwe bike li ser sponsoorgeriyên grûpa sponsorgeriyê yê li dar in li Kanadayê ew yê ku hîn di nava qonaxa yeksaliyê de ne daku teqez bibe ku piştigiriya diravî û ya niştecihbûnê yê lêhatî tene dayîn.

Defaulttek bi dawî dibe dema:

- Grûp pereyên li ser xwe yê aîdê hukmetê dide, ewên ku dikevin sindoqa peredana hukmetê yaku li ber destê kesê/a nûhatî tene dayîn.
- Karmendê/a **IRCC**yê biryar dide ku grûpa sponsorgeriyê bi erkên xwe rabûye.

Defaultta ji aliya diravî dibe ku ji ber grûpa sponsorgeriyê hemû re çê bibe, an jî ji ber endamekî/e tenê.

Çawa mirov dikare xwe ji **dispute, **breakdown**, û **default**an bide alî?**

Gelek baş e ku mirov hewl bide xwe ji **dispute**’ên sponsorgeriyê bide alî. Ev xalên li xwarê balkişandinên girîng di mijara birêvebirina **dispute**’an de ne:

- **Amadekarî:** Divê ku grûpên sponsorgeriyê bi awakî lêhatî ji bo sponsorgeriyê hatibûbin rahênan û bikerestekirin. Kesên **SAH** li ser rahêna **CG**yên xwe berpirs in. **Groups of 5, Community Sponsor, SAH** û **CG** û hevsponsorger dikarin xwe bigihînin gelek keysên rahênanê bi riya malpera Bernameya Rahênanana Spnsorgeriya Penaberan. Refugee Sponsorship Training Program (**RSTP**), malper (www.rstp.ca).
- **Danûstandin:** Danstandina zelal, hevgirtî û bibandor hokareke bingehîn e daku hêviyên realîstîk bên dayîn. Di bin vê mijarê de divê haydarî bên dayîn bo kesên nûhatî piştî gihêştina wan bi demeke kin û herweha bi dirêjîya qonaxa sponsorgeriyê. Ku astengiyên cudahiya zimanan hebin, teqez bikin ku danûstandin bi riya wergerin heman zaraveya kesên nûhatî diaxivin cih bigire, û ji wergeran bixwazin ku agahiyên rast bigihînin bêyî ne tiştêkî zêde, ne jî kêma.
- **Birêvebirina hêviyan:** Ku ji pêşî de mirov çav li hêviyên sponsorgeran û grûpa sponsorgeyê bigerîne, û herweha li hêviyên kesên nûhatî, ev tişt wê gelek alîkar be. Ew dikarî alî bike daku bê xuyakirin ka hêvî “realîstîk” an na. Ku tu hêvî nebin, an hêviyên heyî yê “realîstîk” bin, ev tişt **breakdown**an navkesane gelek kêma dike û her weha acizbûn û jihêvîmanê yê jiber danûstandinê û hêviyên nerealîstîk der tene. Ji kerema xwe li vê agahdarînameyê li ser vê lînkê han binêrin: <http://www.rstp.ca/wpcontent/uploads/2016/07/Managing-Expectations.pdf>

Jevfêmkirin: Bîne bîra xwe ku belkî hûn gelek tiştan dikin bêyî hûn rewş tam fêmkirin, di nav de ka çima kesê li hember me dibe ku bi awakî bi xwe bertek nîşan bide. Dibe ku hin agahiyên şaş hebin an jî bi hêsanî tenê jevfêmkirineke şaş hebe û hûn nehatiye kişfikirin. Dê gelek alî we bike dema hûn hertim têxin bala xwe ku haya we ji tevahiya pêvajoyê nîne. Dibe ku pêdivî bi sebir û jevfêmkirineke bêtir hebe daku danûstandin were pêşxistin û daku hûn bigihin çareseriyê hevpar.

Gelo ez ê li kû bikaribin bêtir agahî û piştgirî bi dest xînim?

Ji bo agahîne bêtir bi hûrgilî derbarê **Breakdown**ên Sponsorgeriyê, hûn dikarin serî bidin li: **In-Canada Processing of Convention Refugees Abroad and Members of the Humanitarian Protected Persons Abroad Classes – Part 3 (IP-3):**

<http://www.cic.gc.ca/english/resources/manuals/ip/ip03-part3-eng.pdf>

Heger hûn li Torontoyê niştecih bûbin û we alîkarî divê sebarê bi **dispute**ên sponsorgeriyê, an jî we agahî divê derbarê **workshop**ên li rê ne li ser mijara Hêvî û Sincên (exlaq) Sponsorgeriyê, têkilî deynin ligel **RSTP's** Toronto Refugee Sponsorship Support Initiative (**Toronto RSS**) li ser navnîşana: torontorss@rstp.ca or 416-290-1700, ext. 404.

Heger hûn li derveyî Torontoyê bin, ji kerema xwe têkilî bi **RSTP** re deynin bi riya eposta: info@rstp.ca an jî li ser jimara telefonê 1-877-290-1701 daku hûn bêtir agahî werbigirin derbarê maf û berpirsyariyên sponsorger û kesên nûhatî; **dispute**, **breakdown**, and **default**ên sponsorgeriyê; **workshop**ên li rê; û tiştine bêtir.

© 2016, **Catholic Crosscultural Services and the Refugee Sponsorship Training Program**. Ev pelgeh di bin siya mafên çapê de parastî ye û mebest jê bikaranîna destûrpêdayî ye. Heger we destûr nebûya û hûn dixwazin keresteya han, beşek jê an jî bi tevahî bi kar bînin, ji kerema xwe têkilî bi me re deynin li ser:

resources@rstp.ca.

Catholic Crosscultural Services

Bernameya Rahênana Sponsorgeriya Penaberan (**RSTP**)

Tel: 1-877-290-1701

Fax: 416.290.1710

E-post: info@rstp.ca, Malper: www.rstp.ca